



SERHAN ISA

kaniya.sipi@web.de

*Xwendineke rexneyî
ji helbesta kurdî
a nûjen re
(Hoseng Broka wek nimûne)
(2/4)*

**AFRANDINA WÊNEYA HELBESTYANE
LI CEM HOSENG BROKA:**

„S.D.Liwîs dibêje: Wêne kehniya helbestê a
bingehîn e.“¹⁸

Herweha „Ebdulqadir Elqet dibêje: Wêne temtêleke huneryane ye.“¹⁹

Li gora piraniya dibistanên rexneyî, xwezayîya berdewamiya wêneya helbestyane berî her tistî bi desthilatdariya dahêner, di warê ziman, sawîr û sêweyê derbirînê ve girêdaye, çimkî herwekî çawa ku di afrandina helbesta kilasîk de, rêzbend û kêse alavên herî serek e û bingehîn e, wisa jî wêne û sawîr giyan û dilê helbesta nûjen in.

Lewra mirov dikare li ser astê giringiya wênesaziyê di helbestê de bibêje, ku herwekî çawa helbest wêneyeke xwesik e herweha wêne jî dikare wek helbesteke xwesik were xwendin û wergirtin:

*Her gav,
her ku roj di henasa
rojvahiyên de
dîskiya,*

*derya...
di kesera te de
dibirisî
û keziyên xwe
di ber serê te de
dadiçikandin
du keskahiyên mist
çavkirêmana
hicrikan.* ²⁰

Bi xwendineke dahênane ji vê helbesta jorîn re, mirov dikare çend xalan destnîsan bike:

1. Zimanê helbestê/ Peyvên rojane:

Peyvên ku di vê têkistê de hatine bikaranîn peyvîne rojane û sade ne. Dibe ku rojê em wan bi dehê caran bikar ditînin, lê bê goman ne bi vî sêweyê derbirîne. Tiste ku helbestvan li wan zêde kiriye, sêweyê honana wan e. Lewra peyv û gotinên ku di gewdê helbestê de bi cî bûne, bi sêweyekî li hev hatî, helbestyane û di ciyê xwe de, hatine bikar anîn. her peyvek bi rehetî li gel peyvên din digunce, û bê guman ev yek ji hostayetîya helbestvan bi xwe ye.

2. Zimanê helbestê/ Peyvên jibîrkirî:

Ew bêjeya rojane ku me bikar ditanî, yan jî ew bêjeya ku li nisîvên kûr jibîrkirî maye, ew a ku em jê re dibêjin (em têngihîn) helbestvan bi destê wê girtiye û vexwendî jiyaneke sermedî û govenda helbestvaniya xwe kiriye. kiras û xemleke huneryane li ber bejna wê a ji bîrkirî kirye.

3. Sawîr:

Her ji vê têkistê diyar û ron e, ku naveroka wê bi rabirdiwê ve girêdaye. Lewra mirov dikare bibêje, ku hisê rabirdûyane parçeyek ji jiyana helbestvan a sawîryane ye.

Ew rabirdû jî rabirdûyeke weha ye, ku her roj tete bikaranîn û dubarekirin. Bi wateyeke zelaltir ew rabirdûyeke weha ye, ku mercên berdewamî û sermedîtîyê di xwe de bi cî kirine, ev ji layekî ve.

Ji layekî din ve, çu wate ji hebûna helbestê re tune ye eger ked, ezmûne, û pêlewaniya helbestvan a sawîryane tê de tune be.

Di têkista jorîn de, bihna helbestvan bi awayekî eskere dikare were xwendin.

Li seranserî têkistê bandora ezmûna wî (dahêner) a sawîryane diyare. Di ciyekî din de ji vê lêkolînê me gotibû, ku destnîsankirina dem û cî di têkistê de, bi sêweyekî kilasîkî, temenê helbestê kurt dike, û mercê berdewamî û jinûvejiyandina wê wînda dike.

Lê pas xwendineke hûr û kûr, ji vê têkistê re, tistekî gelekî balkêş ji min re diyar bû, ew jî ev bû: Dem û cî herdu ji hêla helbestvan ve, di têkistê de hatine bikaranîn, lê bi hunersaziyeke bedew ta wê pileya ku mirov eger hûr û kûr têkistê nexwîne ev hunersazî jê re diyar nabe.

Dem û Ci lebtokî ne, rojane ne, hîm û mercên berdewamiyê di xwe de bi cî kirine.

Dem = Rojava, Cî = Hicrik = Ciyê civanan (hicrika min e , a te ye, a wî ye, a wê ye, a wan e).

Ev herdu dem û cî jî, wek tîna xwendin, du dem û cîyên vekirî ne. Ew bi qasî ku dem û cîyên xilwetgirî û çavliêmana helbestvan in, weha jî dikarin bibin dem û cîyên çavliêman û xilwetgiriya her xwênerekî.

Û weha di „rojavahiya hicrikan“ de yan jî di „hicrikên rojavahiyê“ de, hevdiîna herî sawîriyane û xwesik di navbera helbestvan û xwêner de, pêk tê.

Lewra mirov dikare bibêje, ku di wê hevdiîna de, bi qasî ku helbestvan dibe xwênerekî trajêdiya „Rojavahî“ û „Hicrikên“ xilwetgiriya xwe, weha jî xwêner dikare wekî xwe, bibe helbestvanê wan.

4. Sêweyê derbirîna:

Helbestvan hewl daye, ku di hundirê wêneyeke helbestyane de, bi zimanekî azad î dîrî sîrovekirin û zarpêkirinê, raman û mebesta xwe bighîne xwêner. Ev yek jî bê guman faktorek ji faktorên serkeftin û cihgirtina helbesta nûjen e.

Can Kohîn ku yek ji damezrênerên rexneya nûjen e, di Ferensayê de, dibêje:

„Wêneya helbestyane hemî sînoren dîrokî, ceyografî, û rewsenbîryane diçirîne û derbas dike.“²¹

„ Wêneya helbestyane hebûna xwe di ser dirokê re dibîne “²²

Herweha Can Molîno dibêje: „Wêne dilê helbestê ye.“²³

Ji layekî din ve mirov dikare bibêje ku wêneya gerdûneke hestane ye.

Tenê di çarçewa wê gerdûna hestane de, helbestvan dikare hizir û nerînên xwe, wek afrîdeyekî gerdûnwerî, mîna tabloyeke rêsayî ji peyvan pêskêşî xwênerên xwe bike.

Ew tenê bi nivîsandin û xwendina wê tabloya ku ew bi xwe ye, dikare bi hebûna xwe û derdora xwe hest bike û herweha dikare xwênerên xwe jî bi wê hebûna bide hestkirin.

Ew tablo êsa wî bi xwe ye, herwekî çawa ku ew êsa wê tabloyê ye:

Ji êsê,

tenê ez hîna xistexista tixûban

li pêxên êvariyên te,

bûbûm,

û her ku sev

bi tenhatiya min û te

vêdîket,

bi kesera xwe,

min nalenale te

dikola,

û li ber govenda azariyên te

*min tidarka welatekî
mist ji tozê
mist ji berfê
mist ji rojava
û ji...
li dar dixist
te nav
lê
dikir (.....) ²⁴*

Di çarçewa teyoriya helbestê de tê gotin ku:

„ Erkên helbestvan ji nû ve nivîsandina cîhanê û hemerengkirina tîpan û peyvane” ²⁵.

Angu wêneya zarpêkirî, û sêweyê xîtabyane, ji bilî xwe tistekî din nas nakin. Sêweyê dûbarekirî nikare xwe bi rehetî bilivîne û gedûneke bedew û helbestyane di hisê xwêner de biafirîne. Ew di dawiyê de, dimîne dîle hindêk yasa û rêzikan, ku ew bi xwe jî wêneyan ji hawîrdor ve dorpêç dike. Ew ji helbestê bihtir, xwe wek termekî xîtabyane pêskêş dike :

*Hesarê gundê me ye
destek ne pir fire ye*

*hawîr desta wê çiya
li jor darên deviya*

*herdû alî rez û dar
heta dighê ber zinar*

*çend çiyayê xwedî nav
ko me li wa dikir rav*

*Sêx Sultan û sêx Sehor
çim û hopê hawir dor*

*desta wê tev kanî ne
xo ew jê re danî ne. ²⁶*

Ev helbesta li jor destnîsankirî wek nîgarkêsiyeke bi peyvane qalibkirî, dûzankirî û hîlbijartî, hatiye Formolîzekirin.

Ew tabloyeke xîtabiyane ye, ji hêla dahênerêkî hatiye nivîsandin daku tenê ji hêla wî ve, yan jî wekî wî were xwendin. Dahênerê vê helbestê tenê rê li ber xwendineke yekalî vedike, bê ku derfetên xwendin û xwesiya helbestê ji xwendevanan re bihêle.

Ew her tistî sîrovekirî û zelal li ber çavan datîne.

Tabloya **Hesarê** tenê dikare wek „Hesareke cegerxwînî“ di vê helbestê de, were xwendin. Ew tenê cihekî Cegerxînî ye û çu derfet û îmkan li pêş xwêner tune ne, ku wî cihê (Hesarê) wek cihekî helbestyane û taybet bi xwe, ku bikaribe xwe tê de bibîne, bixwîne.

Bê goman Cegerxwîn navekî mezin e, di meydana helbesta kurdî de, lê ev yek nayê wê wateyê ku her têkisteke ku wî di bin navê „helbestê“ de, rêz kiriye, gerekî wek helbest were wergirtin.

Helbestvanê nemir Cegerxwîn hin caran, ji ber hindê sedemên civakî siyasî...htd, bi alavên durrî helbestê helbesta xwe nivîsandiye, lewra jî ew wek xîtabeke zuha û hisk hatiye derbirîn.

Lê di helbestvaniya Cegerxwîn de, rastiyek heye divê mirov bê alîgirî dirkênîyê pê bike, ew jî ewe ku wî dikarîbû bi rengekî ji rengan xwe ji yê beriya xwe û nifsên pistî xwe veqetîne.

Yên beriya wî bi sêweyekî derwêskî û zimanekî koktêl nivîsandin, belkî ji ber ku nikarîbûn an jî nedixwestin ku xwe ji bin bandora zimanê Erebi ku zimanê Qurana Pîroz û zimanê dîn û dewletê bû, derxînin.

Cegerxwîn bi rengekî ji rengan dikarîbû xîtaba xwe, li ser astê kurdbûnê, hem wek ziman, hem jî wek naverok, zelaltir û paqijtir durist bike.

Lewra mirov dikare bibêje ku Cegerxwîn, heta radeyeke bilind, sêya xwe ji bin bandora zimanê Erebi û xîtaba islamewî a ku pir caran, li dijî kurdayetiyê dihate û hîn jî tete bikar anîn, derxîne, û bi xîtabeke kurdane xwe ji me re pêskês bike.

Pareke mezin ji nifsê pistî Cegerxwîn jî, hatin û bi sêweyekî beloq, zar bi Cegerxwîn kirin û bûn „kopyên cegerxwînî“.

Lewra gelek ji helbestvanên pas qonaxa Cegerxwîn bûn sagirtên kopîkirî û nikarîbûn xwe ji bin bandora wê dibistana Cegerxwînî derxînin, û ne jî sêyan wê bi pê de bixînin.

Belê ne tenê wisa lê gelek ji wan „kopyên Cegerxwînî“ berûpas vegehiyan û mixabin tanî roja îro nikarin bi çu awayî ji derveyî wan „qalibên Cegerxwînî“ ku xwe tê de asê kirine, xwe derbibirin.

Bê goman mebesta min ji vê rawstandina li ser helbesta seydayê Cegerxwîn ne înkarkirina helbestvaniya wî yan jî dibistana wî ye. Mebesta min tenê cudakirina „cegerxwînê helbestvan“ ji „Cegerxwînên din“ e.

Herweha hebûna dibistaneke Cegerxwînî nayê wateya kustina wê bi teqlîd û zarpêkirinê. Gereke nifsên pas Cegerxwîn hewl bidane ku vê dibistanê bi pê bixînin, û mîna rêgehekê di helbesta kurdî de binirxînin.

Herweha gereke ku bi sêweyekî zanistî û bê alîgirî, bi sedan lêkolîn li ser dibistana Cegerxwîn bihatine nivîsandin, lê mixabin ev yek nehate pêkanîn, û para bihtir ji yê ku dest avêtine vê mijarê jî, bi sêweyekî derwêskî, raporên pesin û saloxdanan nivîsandine.

Lê bobelata mezin ew e, ku nifsên pistî Cegerxwîn, her weha besêkî pir mezin ji rewsenbîr û nivîskarên Kurd hatin û ev dibistan wek Perestgehekê li qelem dan. Ew li sîna ku were xwendin hate perestîn.

Herçiqasî ku seydayê Cegerxwîn wek navekî mezin di dîroka helbesta kurdî de hatibe naskirin jî, lê mirov dikare li gor hindê pîvanên helbestyane bibêje, ku wî nikariya guhertineke mezin û berbiçav di helbesta kurdî de çê bike.

Hêjayî gotinê ye, ku çend navên din jî sêya ne di çarçewa heman dibistanê de, helbesteke ne kêmkî helbesta Cegerxwîn binivîsin, wek Seydayê Tîrêj, Salihê

Heydo ... û hindekî din. Lê dîse jî mirov dikare ezmûneya wan wek bareyeke Cegerxwînî li qelem bide.

Dahênerî berî her tistî azadî ye. Dema ku dahêner nikaribe xwe û derdora xwe bi sêweyekî azad û dûrî qeyd, bend û zindanan, bi zimanekî azad û helbestyane, derbibire, wê çaxê wê dahêneriyeke azad ku ciyê bas û lêkolînê be, neyê afirandin.

Gerke ziman roleke berbiçav û serekî di derbirînkirina xweyîya dahêner û derdora wî de, wek arêseke azad, bileyize. Ango pêwîste ku merema dahêner/helbestvan ne tenê sazîkirin û peydakirina rêzband û kêseyên ciwan û bi dîngeding be, ji ber ku bêjeya ne azad a bi bend û merc, nesêt çu carî dahênaniyeke berbiçav biafirîne.

Lewra eger ziman bi sêweyekî azad neyê derbirîn, wê dahêner nikaribe dahênaniyek azad biafirîne, yan jî wê wek dahêneriyeke qels û kêmbimîne.

Helbestvanê nûjen, ne tenê wêne û rewsan radigihîne, belê ew têkildariya di navbera peyvê û peyvê de, mirov û peyvê de, û herweha mirov û mirov de, xwesiktir û helbestyanetir dike.

Helbesta helbestvanekî nûjen jî ancix bikaribe bi azadiyê were derbirînê.

Lewra mirov dikare helbesta nûjen, di pileya yekemîn de, wek helbesta azadiyê li qelem bide. Ê cihêwaziya di navbera helbesta nûjen û klasîk de jî, wek cihêwaziya navbera azadî û neazadiyê ye.

*tu cotkarê kê ye? çiye cotkirin?
ji dijmin re kar û ji bo we mirin*

*we rakir seranser we çol û beyar
tu rencê dikêstî ji bona neyar*

*diçênî, çinîn û hılanîn li te
dikolî û çandin û danîn li te*

*ji bo te dimênî dewê tevde av
ji dijmin re karê te Zêr û Dirav*

*dijî wek sewala di koxên kevin
tijî mar û misk in, bi kevn û tevin*

*bi pala û zana ve tev bibin yek
bi dar û bi top û tiving û bi çek*

*ku çakûç û das û tiving û qelem
li nik me bi rûmet bibin dem bi dem*

*ne Sêx û Mela û ne Axa û Beg
nemênin mirovên neyar û dizik*

*ku rista welatê me bû wekhevî
hemî kes xwedî mal û zêr û zevî.* ²⁷

Xîtaba ku helbestvan di vê helbestê de pêskêşî me dike, û wek ku me li ciyekî din de ji vê lêkolînê destnîsan kiriye, xîtabeke yekalî û yekwate ye.

Xîtab di vê helbestê de, bi sêweyekî rast û rast û mîna pend û sîretan ji bo xwendevanan hatiye derbirîn û pêskêşkirin. Ew wek xîtabekê ji bo aqil berî hest û nestan hatiye afirandin.

Lewra dahênerê wê hewl daye ku xwe wek reformîstekî yan jî sîyasetmedarekî pêskêşî cemawerê xîtaba xwe bike. Ew xîtaba „kurdên prolîtar“ e, a dij bi mella, sêx, axa û began e.

Anku ew xîtabeke „komunîst“ a bi kurdî boyaxkirî ye.

Sedemên rûdana xîtabeke weha jî, bê goman rûdana ramanên Marksîst-lenînîst in, yên ku seydayê Cegerxwîn di qonaxekê ji qonaxên jiyana xwe de, di bin bandora wan de mabû, û di bin wê bandorê de, gelek helbestên bi vî sêweyê xîtabyan e nivîsandin.

Lewra helbesta Cegerxwîn di wê qonaxê de, ji helbestê bihtir, wê xwe wek bangesî û sloganên sîyasî, pêskêş kir.

Ji aliyekî din ve dema ku mirov li zimanê helbesta Cegerxwînî a vê qonaxê temase dike, mirov dibîne ku çawa ziman bûye dîlê helwest, raman, û nerînên siyasî yên ku helbestê û rihê wê ji kokê de têk dibin.

Herweha mirov dibîne ku çawa gerdûna helbestê di bin barê gerdûna helwestê de têk çûye.

Ziman bi sêweyekî hisk û neazadyane ji bo ragihandina raman û nerînê hatiye binbarkirin.

Ji ber ku Ziman gerdûneke bi serê xwe û vekirî ye, lewra ew hertim pêwîstî azadiyeke vekirî ye. Ew pêwîstî rihekî vekirî, hestine vekirî, sawîrekî vekirî û afrîdeyekî/ dahênerekî/ xwênerekî vekirî ye.

Ziman gerdûneke rengereng û azad e, eger dahêner wek afrîdeyekî rengereng û azad danûstandinê pê re bike. Ew di rûberên xwe yên berferê û bê dawî de, cî ji bo her kesî dihêle, lewra ew dikare bibe milkê her kesî, û xwe bi hemî hêz û ciwaniya xwe pêskêşî cîhana her afrîdeyekî bike.

Di azdî û azdkirna zimanê helbestê de her kes û her tist dikare pêregî azadiya xwe were.

Di zimanê azad de, tistên azad, mirovên azad, û têgehên azad, bi sêweyekî azadyane li hev mikur tên:

Birîna te....,

sirûdeke qedaxe bû, di hisê tixûban de.

Li seranserî pistepista derrehê:

Ji dûrahiyên berfê hatanê dûrahiyên nalînê

*dihate gurandin.
 Hemî aliyên bêqubaliya mirazê te:
 Ji pilindiriya birînên bakur
 hetanî serserîtiya sefeqên basûr,
 û ji kelogiriya destpêkê/
 destpêka vêketina êsê
 û resgirêdana „ Çarçira „, yê di xewna
 rojhilat de,
 hetanî birisînên „ Xabûr „, û daçikandina
 „ Xencera Tebgawî „, di kêleka rojava de.
 Birîna te...
 dastanek ji posmaniyê û yadîgariyên
 çelmisî bû,
 vedenga derizandinên min
 dihincand.
 Her ku roj dihate ber êvarê,
 kuxandina te,
 di sîka min de dialiha.
 û dilê min,
 dibû demsalek ji baranê, gav bi gav,
 bi hesreta te
 dibariya. ²⁸*

Di vê helbesta jorîn de, Hoseng Broka ku dahênerê wê ye, û „birîna yara wî“, „sirûdên qedaxe“, „tixûb û alî“, „Çarçira ya resgirêdanê“, „ birisînên Xabûr“, „Xencera Tebgawî“ û „demsalên ji baranê“...htd. destmalkên êsa azadiya xwe ji hev re li ba dikin û bi wê ês û azadiyê jî li hev mikur tên û herweha derfet û îmkanê li pêş her tist û her kesî vedikin, daku wê ês û azadiyê wek ês û azadiya xwe bixwînin û binivîsînin.

WÊNEYA HELBESTYANE

Û

GIJGIJANDINA HESTÊN XWÊNER:

Li gora hindêk nerînên rexneyî „gijgijandin û tujiktêdanên ku dahêner di hestên xwênerên xwe de çê dîke, an jî çawa van hest û nestan li bal (xwêner) dilivîne, bi du sêweyan pêk tê:

1. Bikaranîna alavên huneryane, sipehîbûna wêneyêyên taybt, û herweha sêweyê derbirînê û bikaranîna ziman.

Çiqasî ev di radeyeke bilind de, di helbestê de, werin bikaranîn, ewqasî xîtab jî bilind û xwesik dibe.

2. Amadebûna xwênerekî çalak, û ev amadebûn jî bi cî nayêt eger dahêner mercê yekemîn li ba xwêner nexuliqîne, ew jî di serî de, nêzîkbûna xwêner ji berhem re ye. Yan jî bi wateyeke din ew nêzîkkirina hest û nestên têkistê ji hest û nestên xwêner ye.

Ango kêlîka pêsi dema ku xwêner helbestê dixwîne an jî guhdar dike, pêwîste ku heta radeyeke serkeftî û bilind bikaribe xwe tê de bixwîne yan jî guhdar bike û binvîsîne.

Lewra pêwîste ku têkildariyeke helbestyane di navbera rihê têkistê û rihê xwêner de, were damezrandin.“²⁹

Herweha dahênerî tabloyeke vekirî ye li pês gelek xwendinan, ew tabloyek di hundirê tabloyê de, yan jî xwesîkbûneke di hundirê xwesîkbûnê de.

Lê dahêneriya bê sawîr û wênesazkirin jî dahêneriyeke kêr û seqet e.

„Wêne jî dahênanek tayîbet a bi serê xwe ye , lê ne zarpêkirin û ji ber kirine.“³⁰

Wênesazkirin projeyê afirandina xwesîkbûnê ye, ew projeyê xwesîkkirina mirov, xweristê û gerdûnê bi gîstî ye.

Û herçiqasî dahêner bikaribe di wênesazkirinê de, xwe ji zarpêkirin û kopîkirinê rizgar bike, hewqasî wê wêne xwesiktir û bilindtir rû bide , û wê bikaribe bêhtir bandora xwe li ser xwêner bike, û merama xwe bi cî bîne.

Di wênesazkirineke xwesik de, dahêner dikare bihêle, ku her kes û her tist xwe xwesiktir û kesxetir bixwîne û binivîsîne:

Gelyê Lales...!?

*ji çaxê ku min **Berat**¹ diramîsand
di pêsiira xewnên pêxwas de,
ji wî çaxî ve
tu di istanên min de,
hatî misextkirin
tivingek
ji kêr....
bûyî
û... xewnek
di tixûbên sê qembûrên kurkirî de.
Heftê û du welatên kwînêrdayî
te lorandin
û tu...?
hîn nerazaye.
Kûrêna Hizret
konên qetiyayî
li bayebanên **Derwês û Edûlê**
vedide,
û tu **Serbikên** xwe
vê...ldike
ji bédengiya **Terqînê** re.*

*Miset.... gewînekî gurandiye
li ser çiçikên te.
Erefat... dîdevanekî çavlixew e
li ber pêkên te,
û heywanên te...
di qerebalixe kustaran de
digevizin.
Gelo...!?
tu bi milên kê ve mayiye
daleqandî
E*

L

E

N

D

E

ke pelixî???!³¹

Herçiqasî ku taybetmendiyeke berbiçav a helbestvan di vê têkista jorîn de, xwe pêskês dike jî (Cihê taybet/ Lales/ Miset/ Hizret/ Erefat...; dema taybet/ dema „Beratramîsandinê“; xewna taybet; kûrênên taybet; elenda taybet; êsa taybet; bendewariya taybet...htd), lê ev taybetmendî di xwendinên curbecor de, dikare bi gengazî wek „taybetmendiyeke gelemper“ di qonaxa xwendinê de were hestkirin û herweha parvekirin.

Anku her xwênerê dikare li gora xwendina xwe a taybet, cî, dem, xewn, birîn û êsa xwe a taybet di vê têkistê de bixwîne û herwisa binivîsîne.

Xwendin dan û satndineke xwesike di navbera xwêner û têkistê de, yan jî di navbera pirsên xwêner û pirs û bersivên têkistê de.

Û di vê navberê de xwêner dibe afrênerê diwem ji têkistê re, û bi vê yekê û bi liv û çiva ku li seranserî têkistê dike, ew û têkist derbasî gerdûna hev û din dibin û di serencamê de, bandoreke pozîtîv li xwêner dibe û dikare di bin wê bandorê de, xwe di xwendina xwe de, ji nû ve bixwîne û binivîsîne.

Lewra mirov dikare bibêje, ku her xwênerê xudan karînek rewsenbîrî têgihjtinî a taybet bi xwe heye, û li gora wê karîna xwe gerdûna têkisteke taybet bi xwe ji têkista orîjînal (a dahêner) diafirîne.

(Dûmahiyek heye)

***tirej.com
27/07/2003***